# ŞÊRGO CÎHANÎ Azad e!
## Pîrozname

16/02/2007

Hêja, kak **Şêrgo CÎHANÎ**
Rêz û silav…

Bi şanazî û dilxweşî, me mizgîniya serbestberdana we bihîst, ji ber vê yekê jî, em xwe bextiyar dibînin ku tu di nava gelê xwe de bi azadî dijî, bi hêviya ku rojek bi ser cîhana me de were, tu kes ji ber nerîn, bîrbawerî, nijad û ola xwe tariya zindanan nebîne.!! Em bawer in ku bi saya xebata têkoşer û mêrxasên zîrek di ber doza gelan, mafên mirov û mirovatiyê de, cîhana me nêzîkî wê rojê dibe.

Di bûyera reş a zindankirina we de, gelek sazî, nivîskar, kovar û rojnameyên kurdî û yên cîhanî piştgiriya we kirin, ev yeka han ne minet e, lê belê ew erk û stubarê me hemiyan e ku di riya kar û xebatê de em alîkar û piştgiriya hev bikin.

Li Sûriyê jî, kovar û weşanên bi zimanê kurdî têne çapkirin, ji nav wan jî weşana me ya du mehane(NEWROZ), bangek ji çapemenî û raya gîştî re weşandin, têde, zindankirina we şermezar kirin.

Hêvî û omîda me ew e ku; Gelê Iranê bi hemû neteweyên xwe ve, bend û kelemçeyên rijîma komara Islamî ya kevneperest bişkîne, bi azadî, serfirazî û wekheviyê şa bibe, gelê kurd jî mafên xwe yên netewî bidestxîne.

Bi serbestberdana we em zor şa û bextiyar in!

Desteya weşana **NEWROZ**
Sûriya 16/02/2007

***Hêja kak Şêrgo…***

*<u>Eger tu bixwazî</u> û bi te ne zehmet be, tu ji xwendevanên NEWROZê re li ser kurtejiyana xwe, ya malbata xwe a xebatkar û sedemên girtina xwe binivîsî, wê pir baş û hêja be. Lê eger rewşa te ya ewlekarî rê nede vê yekê, dîsa em we pîroz dikin û zor sipas.*
*Digel ciwantirîn rêz û silav*

**Bersiva kak Şêrgo Cîhanî**

**li ser Pîroznameya NEWROZ ê**

Berê her tiştek silaw û rêz û sipasîya xwe pêşkeşî xebatkarên kovara pîroz a NEWROZ dikim
Hevalên hêja
Her çi qas ez ne layqê ew qas mezin kirinê me û ez jî însanekim wek hemî kurdên bindestê cîhan, lê ji ber piştgîrî dayîna kesên wek we, em li hember dujminan mezin dibin û jîyana me jî gohartinên nû di xwe de çê dike. Ew jî nîşan dide ku ragehandinên kurd mezin in û dikarin hêzên xweyî nîşan bidin û dewletan lawaz bikin. Xebata we hemîyan pîroz dikim...
Bi rastî eger piştgîrî ya me kurdan li hevdû nebe, dewletan wê me bi rehetî,. bixon û bi her awayî reftar bikin Careka din gelek ⟶